Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :863 12-Gulan- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165



# Welatiyên Qamişlo: Tevî bihabûnê jî emê cejnê pîroz bikin

Dilîn EHMED/Qamişlo

**Ji bo amadekirina cejina Remezanê welatiyên bajarê Qamişlo berê xwe didin bazarê. Tevlî bihabûnê û belavbûna vîrûsa korona jî, gel bi coşekê mezin cejnê pêşwazî dike.**



Welatiyê bi navê Yûnis Remo diyar kir ku, ji ber daketina nirxê lîreyên Sûrî li hember dolar, ew nikarin wek salên berê pêdiviyên cejnê bikirin û wiha pêda çû; “tevlî bihabûna nirxên cil û pêdiviyên cejnê jî, ji bo kêfxweşiya zarokan em amadekariyên xwe dikin.”

**“PÊŞWAZÎKIRINA CEJNA ÎSAL NE WEKE SALÊN BERÊ YE”**

Yûnis Remo li ser cejnê axaftina xwe wiha domand: “Cejna remezanê bi kirîna şeker û cilên nû tê pêşwazî kirin, ev çandeke di nava civakê de ye. Her sal seatên sibehê em diçin ser goristana, piştî wê em serdana heval û dostên xwe dikin. Ev jî kevineşopiyên me ne. bi vî rengî em cejina xwe pîroz dikin.”

Yûnis li ser bihabûna nirxê pêwîstiyên cejinê axaftina xwe wiha bidawî kir; “Ji ber daketina nirxê lîreya Sûrî li hember dolar, nirxê her tiştî bihabû ye. Lewre em îsal nikarin weke salên borî, pêwîstiyên cejinê bikirin. Dema dolar dadikeve jî, nirxê pêdiviyan wek xwe dimîne. Ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê, divê



saziyên berpirsyar bixebitin. Ji ber zarok nizanin bihabûn û tine bûn çiye, û em jî nikarin dilên wan bişkînin, em neçar dibin cil û pêdiviyan ji wan re bikirin. Gazinc ji zarokan nabe, lewra ew çav zarokên din dikeve.”

**“ZAROK CEJINÊ XWEŞ DIKIN”**

Li ser heman mijarê jina bi navê Henîfa Yûnis ya 70. salî jî wiha axivî: “Rasete ku divê cejinê de



em cil, şekir û pêdiviyên cejnê bikirin. Lê îsal ji ber bihabûna bê sînor, me cil tenê ji zarokên piçûk re kirî. Ji ber bihabûnê me ji bilî şekirên zarokan şekir nekirîn. Lewra cejin bi zarokan xweş dibe. Mijareke ji vê girîngtir heye ku gelê me biryara qedexeyê binpê dike, ev yek jî xeteriyê li ser mirovan çêdike. Raste xelk neçarin biçin bazaran, lê divê tedbîrên xwe yên parastinê bikar bînin.”

Henîfa Yûnis didawiya axaftina xwe de, cejina gelê Sûrî bi giştî û bi taybetî cejina gelê bakur û rojhilatê Sûriyê pîroz kir û got; “em bi hêvîna ku êrişên li ser welatê me bin bikevin û cejin bibe wesîleya serkeftinê, ku em sala bê cejina xwe bi rengekî hîn xweştir pêşwazî û pîroz bikin.”

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | N | E | Q | E | B | ■ | S | ■ | A |
| 2 | A | ■ | E | Y | ■ | X | E | C | Ê |
| 3 | L | İ | L | A | V | ■ | R | A | ■ |
| 4 | ■ | Z | E | R | ■ | B | A | ■ | L |
| 5 | S | ■ | M | ■ | L | E | Y | L | A |
| 6 | S | B | ■ | H | I | L | ■ | A | V |
| 7 | ■ | E | T | Ê | ■ | Ê | M | ■ | A |
| 8 | A | J | ■ | J | I | ■ | A | D | ■ |
| 9 | B | İ | R | A | ■ | A | K | A | M |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 2 | | | | | | | ■ | | ■ |
| 3 | ■ | | ■ | | ■ | | | | |
| 4 | | | | | | ■ | | | ■ |
| 5 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 6 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 7 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 8 | | | | | ■ | | | | |
| 9 | ■ | | ■ | | | | | | ■ |

**ÇEP-RAST**

1. Gora ji kevir yan ji mermer qewartî
2. Ruhber
3. Parsûyên masiyan
4. Sindoqa ku pê qûm û tiştê wisa tê pîvan... Dewara nêr
5. Cihê heranê... Alava ku pê hespan tîmar dikin... Peyva neyînî
6. Di dîrokê de dewleteke Kurdan... Heyf
7. Mehek... Jimara du, çar, şeş, heşt û hwd.
8. Jêderka avê... Kesê ku di karekî de xwediyê rayeya fermankirinê
9. Meha dawî

**JOR-JÊR**

1. Kurtiya elementa Aktînyûmê... Tiştanok, têderxistinok
2. Pirsgirêk... Kurtiya ajansa fermî ya Tirkiyê
3. Rojek... Demên rojê
4. Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye... Keleşêr
5. Notayek... Wekhev
6. Genimê hêrayî... Mîrîtiyeke Kurdan
7. Kurtiya Zîv... Pirç
8. Beşer, mirov... Alava ku datînin ser hespan û li serê siwar dibin
9. Tiştê ku pê debar tê kirin

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| **Abone** (Fransî) | **1.Kesê ji bo demekê rojname, kovar û hwed. dikire û pereyên wan pêşî dide: Ez aboneyê rojnameya Ronahî me. 2.Kesê çûna ciyekî ji xwe re kirî edet** |
| **Alternatîf** (Fransî) | 1.Bedîl: Ku tu bi min re neyî jî alternatîfa min heye. 2.Cuda. 3.Dijber |
| **Amanc** | Kêlika ji bo ceribandina sekvaniyê tê vedan, yan ciyê ji bo vî karî tê diyarkirin û guleyan berdidinê. |
| **Armanc** | Tişta mirov dixwaze bi dest bixe, yan xwe bigihîniyê. Hedef, mebest, meram, mexsed, daxwazî, doz: Armanca me azadiya Kurdistanê ye |
| **Dosya** (Fransî) | 1.Agahî û belgeyên li ser heman mijarê, heman kesî û heman karî. 2. Qapê ji kartonan çêbûyî yê belgeyên bi vî rengî tê de kom bûyîn. |
| **Pêşbînî.** | Texmîna li ser paşrojê; baweriya bi bûyerên ku wê di demên pêş de biqewimin: Li ser paşroja Kurdistanê pêşbîniyê te çi ye? |
| **Pratîk** (Fransî) | 1.Tiştên bi hêsanî pêk tên; tiştên bikeys. 2.Kesê ji pirsgirkan re bilez û bi hêsanî çareyan dibîne: Mirovekî pratîk e. |
| **Qonax.** | 1.Serdem, merhele, gihanek, pêvajo. 2.Dûrayiya ji derekê, mesafe, qeder. 3. Xan, qesir, saray, avayî |
| **Yekser** | Rastûrast, rêûrast, yekderb, rast, bênavber, bê ku biçe ciyekî din |
| **Yekcar.** | Ji binî, hîç, bi ti awayî, |

## Tûrikê çîvanokan

*Di tûrikê me de îro çîvanoka li ser mişko heye. Li her dera mirov dijîn mişk dibin belaya serê wan. Mişk hem xwerek dilewitînin, hem dibin sedema nexweşiyê. Mişk hem pir jîr in hem ciyê serê wan tê re derbas bibe gewdeyê wan jî derbas dibe. Dermanê rizgariya ji mişkan pisîk e. Em binêrin ka çîvanoka me ya li ser mişko çawa ye.*

### MIŞKO



Ho mişko mişko mişko
Mîrê mişkan e
Hev dane ber ingûşka
Şêrê mişkan e
Ser parî nanê hişk e
Mîrê mişkan e
Şev û roj xirepişk e
Şêrê mişkan e
Pisîkê simbêl ba dan
Mîrê mişkan e
Mişk revîn ber enîşka
Şêrê mişkan e
Hebanê me reqreq e
Mîrê mişkan e
Mişka kirye deqdeqe
Şêrê mişkan e
Paşîva mişko keşk e
Mîrê mişkan e
Nîvişkê nava meşk e
Şêrê mişkan e

# Dewleta tirkî dixwaze di Şexsê Rêber Apo de, bi faşîzmê mirovayiyê tine bike



***Şêniyên Qamişlo***: Bi tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan, dagirker dixwazin vîna gelê Kurd têk bibin. Ji ber ku gelê Kurd û gelên cîhanê yên bindest fikir û felsefeya Rêber Apo esas digrin û xwe bi vê yekê xwedî vîn dikin. ***R-5***


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 863 12-Gulan- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## “Qutkirina ava Firatê û bikaranîna çekên Kîmyayî amûrên qirkirinê ne”



Nûnerê Rêveberiya Xweser yê li başûrê Kurdistanê diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker, bi qutkirina ava çemê firatê dijberiya xwe ya li dijî gelên Rojhilata Navî û nîşanên qirkirinê, eşkere dike.***R-2***

## Kurdistaniyên Başûr: PKK parêzvana kurdayetiyê ye



Azad Îbrahîm: Divê helwesta gelê kurd bi qasî êrişan dijwar be; berxwedana gerîla bi dengekî bilind bê pîrozkirin û divê em dijmin têk bibin. ***R-4***

## Amedekariyên bernameya ezmûnên refa 9 Û 12an



Desteya Perwerdê û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê, bernameya ezmûnên dawiya salê, yên refa 9 û 12an amade kir. Derbarê mijarê de hevseroka Desteya Perwerdê Rohat Xelîl diyar kir ku li gorî asta xwendekaran pirsên ezmûnê hatîne amadekirin. R-6

## Wêneyên li ser textan



Wergêr Cemal Hacî ji bajarê Sine ye. Pênc pirtûkên bi Farisî wergerandine Soranî û du pirtûkên Soranî jî wergerandine Farisî. Di heman demê de bi Soranî romanek jî nivîsandiye. Lê vê dawiyê, em wî bi şêwekarî û nîgarkêşiyê nas dikin û dibînin. R-7

# EW RÊBERÊ AZADÎ, MİROVAYÎ Û WEKHEVİYÊ YE



# “Qutkirina ava Firatê û bikaranîna çekên Kîmyayî amûrên qirkirinê ne”

**Nûnerê Rêveberiya Xweser yê li başûrê Kurdistanê diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker, bi qutkirina ava çemê Firatê dijberiya xwe ya li dîjî gelên Rojhilata Navî û nîşanên qirkirinê, eşkere dike.**



**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Hovitiya dewleta Tirkî ya dagîrker, li hemberê Kurdan li her çar perçeyên Kurdistanê û gelên rojhilata navî dewam dike. Qutkirina ava çemê Firatê jî yek ji nîşanên qirkirinê ye. Berferehbûna sûcên wê li seranserê Rojhilata Navî jî, eşkere dike ku bêdengiya hêzên navnetweyî, Tirkî hêz digire û dawî li êrişê xwe naîne.

**“QUTKIRINA AVÊ SÛCEKE MIROVÎ YE”**

Nûnerê Rêveberiya Xweser yê li başûrê Kurdistanê Alan Sîlvî, bal kişand li ser êriş û projeyên dewleta tirkî ya dagîrker û wiha bi lêv kir :”Bêgoman Erdogan çekên kîmyawî û yên qedexekirî di êrişên xwe de bi kar tine. Lê digel vê yekê jî êriş û projeyên wê li ser destê tevgera azadî puç û bêbandor in, ji ber ku di êrişan de sernakeve. Qutkirinq çemê Firatê jî weke êrişeke qirkirinê li ser gelê bakur û rojhilatê Sûriyê dide meşandin. Ev sûc jî, rasterast li dijî zagonên mafê mirovan e. Bi neyînî bandor li jiyana rojane ya mirovan dike û xetereke pir mezin li ser jiyan û aboriya bi milyon sîvîlan çêdike. Ev sûc jî li ber çavê civaka navneteweyî tê kirin.”

**“HELWESTÊN IRAQÊ ŞERMOK IN, KARESATEKE MIROVÎ WÊ ÇÊBE”**

Sîlvî di axaftina xwe de diyar kir ku Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, gelek caran bang li hêz û rêxistinên navneteweyî kir, ku rê li ber Tirkiyê bigirin û êrişên wê yên qirkirinê jî bidin rawistandin û bi bîr anî ku heya niha tu helwesteke navneteweyî ya bi bandor nehatiye diyarkirin. Aalan Sîlvî bi vê peyamê axaftina xwe qedan: “Helwestên hikumeta Iraqî di derbarê van êrişan de şermok in. Divê Iraqê weke yek ji endamên Neteweyên Yekbûyî gilî li Tirkiyê bike û binpêkirinên wê rawestîne. Herî kêm dikare têkiliyên xwe yên dîplomatîk bi tirkî re qut bike û zextê li wê bike ta ku rêzê li serweriya Iraqê digire. Lê ti bertek û nîşanên vê yekê ji aliyê hikumeta Iraqê nehatina kirin. Encama qutkirina avê jî di salekê de wê diyar bibe, ziwabûneke xwezayî wê belavî herêmeke fireh li Rojhilata Navî bibe û wê sedema çêbûna karesateke mirovî çi li Iraqê, çi jî li bakur û rojhilatê Sûriyê çêbe.”

## Şêniyên Taxa Tey êş û hêviyên xwe vedibêjin

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Piştî rizgarkirna taxa Tey ji çeteyên girêdayî hikumeta Şamê, şêniyên Taxê diyar kirin, ku di bin serweriya çeteyên “Parastina Niştimanî” de gelek astengî ditîne. Şêniyan bang li Rêveberiya Xweser kir, ku zû saziyên xwe li taxê veke, pirsgirêk û zehmetiyên bi hebûna çeteyan li taxê derketibûn, çareser bikin.**

**“DEBARA JIYANÊ PIR ZEHMET BÛ”**

Derbarê rewşa li taxa Tey de welatiyê bi navê Ebudlah Enter, bûyerên berî rizgarkirinê wiha bi bîr xist:”dema ku tax dibin serweriya çeteyên “Parastina Niştimanî” de bû, me gelek astengî ji bo debara jiyana xwe didît. Hebûna wan, şertûmercên jiyanê ji hemû aliyan ve xerab dikir; Me cereyên gazê nedidîtin, çetan di dizîn û bi bihayeke giran dihatin firotin. Ji ber wê em jî neçar diman, ku cereyan bi wê bihayê bikirin. Nan jî nedihat bi dest xistin û bi 1000 lêrê sûrî dihat firotin. Herwiha Li ser bendên kontrolê yên çeteyan, gelek astengî ji şênî û bazirganan re derdiketin. Pirsgirêka qutbûna avê jî bi dehan sale di taxê de dewam dike, ti çareserî jê re nedikirin. Hêviya me ewe ku saziyên Rêveberiya Xweser bi rêxistinî li taxa me jî dest bi karê xwe bikin.”

**PENABERTÎ, ZOR Û ZILMA ÇETEYAN**

Jina penaber ya ji bajarê Serê Kaniyê Meha Ehmed ku li Taxa Teyî dimîne li ser heman mijarê, zehmetiyên jiyana malbata xwe wiha bi lêv kir :”Dagîrkeran malên me desteserkirin, em jî penaber bûn û hatin vê taxê. Alîkariyên ku ji aliyê rêxistina Mafê Mirovî ji penaberan re dihatin û dikeftin destê çeteyên Parastina Niştimanî. Ev alîkarî li me belav ne dikirin û li ber çavên me li sûkên taxê dihatin firotin. Digel penaberiyê zordestiya çeteyan jî, debara jiyanê zehmetir dikir. Hêviyên me bi jiyaneke xweş nemabû. Lê niha em dîsa bihêvî bûn û daxwaza me ewe ku zû komîn li taxa me jî ava bibin,



kar û xizmetê ji bo şêniyên taxê destpê bikin.

**BI SAZIYÊN RÊVEBERIYA XWESER RE EMÊ VÊ REWŞÊ BIGUHERÎNIN**

Dermanfiroşê bi navê Mihmed Ehmed Elî jî wiha nirxand: “Taxa me ji xizmetguzeriyan bêpar bû. Ji 1980î ve, ti kar ji aliyê saziyên hikumeta Şamê ve, li taxê nedihat kirin. Herwiha ji ber hebûna çeteyên “Parastina Niştimaî” me dikarî hinek cureyên dermanan bi dest bixin. Li taxê jî ti navendên tenduristiyê tine bûn. Ev yek tenduristî û jiyana wan dixist xeterê. Hêvîdar im ku ew rewşa xerab were guhertin. Emê li gel Rêveberiya Xweser alîkarbin heta ku taxa me pêş bikeve.”

## Li Dirbêsiyê di bihevçûna navbera du malbatan de 2 kes mirin, yek birîndar bû

**Êvara Yekşemê di navbera du malbatên ji eşîra El-Badîne yên li gundê Til Kerem yê navçeya Dirbêsiyê de pevçûn derket. Di encamê de 2 kesan jiyana xwe ji dest da û yek birîndar bû.**




Li gorî agahiyên ji çavkaniyên herêmê bi dest ketîn, sedema nakokiyê pezê malbata Hesen Elo Seîd ketiye nava zeviyên çandiniyê yên avî yên malbata Hec Eslan Osî. Li gorî çavkaniyên ji gund, di encama nakokiyê de her du malbatan gule li hev reşandine û 2 kesan jiyana xwe ji dest daye û yek jî birîndar bûye. Yê birîndar birine naexweşxaneya Qamişlo û rewşa wî giran e.

*ANHA*

## Welatî: Rêveberiya Xweser îradeya me ye

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Projeya Rêveberiya Xweser li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi kêfxweşî hate pêşwazîkirin û bi awayekî berfireh hemû pêkhate ji Kurd, Ereb, Şerkes, Suryan, Ermen û Turkmen hembêz kir. Ji ber cihek di nava rêveberiyê de da hemû pêkhate û beşên civaka Sûrî.**





Têkildarî mijarê şêniyên bakur û rojhilata Sûrî nêrînên xwe ji Rojnameya me re anîn ziman û gotin ku gelo çima heta niha Rêveberiya Xweser ji aliyê navneteweyî ve fermî ne hatîye qebulkirin!

Welatiya bi navê Newroz Hemê ku ji gundê herêma Şêxo yê girêdayî navçeya Amûdê, têkildarî mijarê wiha got: “em fêm nakin ka çima heta niha itîraf bi Rêveberiya Xweser ji aliyê siyasî de nehatiye kirin. Rêveberiya Xweser çareseriya tekane ji aloziya Sûriyê re ye. Xwestekên gel pêk tîne. Hemû pêkhate ji Kurd, Ereb, Aşûrî, Suryan di nava xwe de hembêz kiriye. Em jî dixwazin weke hemû gelan mafên xwe bidest bixin. Ma heta kengî wê maf û îradeya gelê Kurd were binpêkirin! Rêveberiya Xweser îradeya me ye û rêya tekane ya maf û azadiya gel bidestxistinê ye.”

Her wiha welatiyê bi navê Safwan Delly jî wiha got: “ sedema ku heta niha itîraf di aliyê navneteweyî de bi Rêveberiya Xweser nehatiye kirin ewe ku, dijminên mirovahiyê baş dizanin ku Rêveberiya Xweser bi saya fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan hatiye avakirin. Tirsa wa ewe, ku ev pergale dê maf û azadiya gelan bidest bixe û ew tekane rêya çûna ber bi azadiya gelan ve ye. Sîstema desthilatdar ya dewletê naxwaze ku gel azad bibe û mafên xwe yên azadiyê bidest bixin. Lewra ji alîyê dewletên navnetewî Rêveberîya Xweser wek vîna gel bi fermî nayê qebûlkirin.”



# Wêneyên li ser textan



Wergêr Cemal Hacî ji bajarê Sine ye. Pênc pirtûkên bi Farisî wergerandine Soranî û du pirtûkên Soranî jî wergerandine Farisî. Di heman demê de bi Soranî romanek jî nivîsandiye. Lê vê dawiyê, em wî bi şêwekarî û nîgarkêşiyê nas dikin û dibînin.

Ew li ser textan bi elektrîkê wêneyên mezinên Kurdan çêdike. Heta îro wî wêneyên Rêber Abdullah Ocalan, yek ji pêşengên tevgera jinên Kurd şehîd Sakîne Cansiz, serokê yekem yê tevgera Komala şehîd Fuat Mistefa Sultanî çêkirine. Wî wekî din, wêneyên helbestkar Şêrko Bêkes û gelek kesayetên din jî xelas kirine.


Ew dibêje, “Ez dixwazim nexşeyeke Kurdistanê li ser textekî berê wî 4 metre û 3 metreyan jî bilind çêkim. Li ser vê nexşeyê jî 70 bajar û 70 mezinên Kurdan wê bêne xuyakirin.” Cemal Hacî dixwaze vê tabloyê bajar bi bajar bigerîne û paşe jî diyarî saziyeke neteweyî bike.

***Ozgûr Polîtîka***

## ‘Huner ne qezenckirina diravan tenê ye, xweîfadekirin e’

***Melîke Aydin***

Ayşegul Kuru diyar kir ku di pêvajoya pandemiyê de ji ber huner û hunermend avêtin derveyê civakê 102 muzîkjenê întîxar kiriye û dema huner ji civakê bê derxistin rizandina civakî jî kûr dibe.



Ji ber pandemiyê bi hezaran hunermendên betal man, li dijî birçîbûn û xizaniyê têdikoşin. Li gorî qeydên fermî yên pêvajoya pandemiyê, 102 muzîkjenê întîxar kirine. Solîsta Koma Zoka Muzîsyen Ayşegul Kuru, bi lêv kir ku ji ber huner ji civakê hat derxistin, wê bixwe re rizandina civakê jî tîne.

Herwiha li ser muzîkjen Erkan Ogur pêş ketine û wiha balkişand ser girîngiya helwesta hunermendên muxalîf: “Veşartina nasnameyan dibe sedema pêşîgirtina nîqaşên me pêşdixînin.”

**‘Berê li hunerê xwedî derdiketin’**

Ayşegulê da zanîn ku kedkarên çand û hunerê beriya pandemiyê jî bi heqdestên kêm û bê ewlede dixebitîn û wiha pê de çû: “Rexneyên li hember hikûmetê jî dibû sedema lêpirsînên qanûnî. Huner ne tenê qezenckirina pereye, xwe îfadekirine. Mafê me heye ku em fikrên xwe bêjin û vê bi karê xwe bikin.”

**‘Divê ji sekna xwe tawîzê nedin’**

Ayşegulê, destnîşan kir ku di demên dawî de Erkan Ogur yê bi nasnameya xwe ya muxalîf tê nasîn, di albuma wî de berdevkê serokomariyê Îbrahîm Kalin cih girt û Ayşegul mijar wiha nirxand: “Vê jî qada hunerê kir du beşan. Ez ji kesekî ku wisa bi nasnameya wî bawer bûm helwestek wisa erênî nabînim. Ji ber zextên em ji ber rêveberiyê dijîn, divê sekna mirovan hinek din saxlem be. Rexneyên hinek hunermendên muxalîf wek lînçkirina Erkan Ogur hat şîrovekirin. Min jî rexne kir. Ger ku seknek muxalîf ya hunermend hebe divê navberê bixe navbera xwe û desthilatdariyê. Divê rexneyên xwe bidomîne û bêdeng nemîne. Ji ber em li ber çavane, divê em fikrên xwe bêjin. Ez tenê ji bo mirovan kêfxweş bikim stranan nabêjim. Ger em nasnameyên xwe veşêrin, wê pêşî li nîqaşên ku me pêş dixînin, bê girtin.”

**‘Apolîtîkbûnê diafirîne’**

Ayşegulê destnîşan kir ku di qada hunerê de di gelek qadan de ev nêzî 10 sal in apolîktîkbûn tê jiyîn û ev jî ji ber tirsê pêk tê û ev tişt bi lêv kir: “Hunermend Sila jî ber hinek rexne kirin, konserê wê hatin qedexekirin. Li erdnîgariya me destûr bihata dayîn gelek hunermendî dikaribû muxalefet bikira. Ya rast eve, dema mirov hinek tiştan hildiberînin divê mirov ji polîtîkbûnê dûr nabin. Rexne di xwezaya wê de heye.”

**‘Ev ne tiştekî nû ye’**

Ayşegulê diyar kir ku beriya pandemiyê jî pisgirêkên aboriya hunermendan hebûye û bi pandemiyê re hîn bêtir giran bûye û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Hunermendên wek Haluk Levent ketin navberê. Kedkarên çand û hunerê fêde girtin. Ji alîkariyên dewletê jî yên nêzî wan fêde girtin. Cotstandartiyek mezin heye. Ligel hunerê, ji rêderketina civakê jî mijara gotinê ye. Çavkaniya vê jî ev e ku çanda rexneyê hatiye tunekirin. Di seranserê dîrokê de ligel hunermendê nêzî desthilatdariyê yên muxalîf jî hebûn û globalbûna civakî bilind bûye.”

**‘102 mûzîkjenan xwe kuşt’**

Ayşegulê balkişand ser pêvajoya pandemiyê ku bandor li ser hunermendan kiriye û wiha berdewam kir: “Li gorî daneyên fermî 102 muzîkjen ji ber betaliyê întîxar kirine. Ez jî di karekî dij sektorê de ku heqdestê wê di bin mûçeyê asgarî de ye dixebitim. Em nehatin dîtin, tune hatin hesbiandin. Pakêtek civakî veqetandin. Sê mehan carê min hezar TL girt. Ev tişt pêkenokek e. Gelek întîxar çêbûn, lê di çapemeniyê de kêm hat dîtin. Piştî qedexeyên mijdarê çalakiya me ya ‘ne jiyanê kovîtî biqedîne’ pêk hat. Me bi bêdengî di navbera 22.00 û 22.30’an de enstruman danî ber xwe û em sekinin. Li bajarên din jî pêk hatin. Mehek û nîv berdewam kir. Piştre me veguhert protestoya deng. Me bi şaredariya Îzmîrê re hevdîtin kir. Biçûk be jî konser organîze kirin lê ev têr nake. Întîxar encama îzolasyonê ye. encama îzolasyonê jî hunermendên dawî li jiyana xwe anîne. Îzolasyon jî rizandinê mezin dike.”

## Dîdara Rojava ya huner û şêwekariyê li bajarê Tebqa dest pê kir

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Bi durişma”Hemrengiya me jêdera bedewî û hêza me ye, em bi hevre hunerê bikin buhara dilan” Desteya Çand û Huner ya bakur û rojhilatê Sûrî dîdara Rojava ya huner û şêwekariyê ya sisiyan li bajarê Tebqa li dar xist.

Dîdar bi deqeyekê li ser giyanê şehîdan hat lidarxistin. Herwiha hevserokê meclisa pêkanînê ya bajarê Tebqa Ebdilezîz Esker, hevsroka desteya çand û huner Ronahî Hesen û endamê kome amadekar Ekrem Tanî li ser vekirina dîdarê axivîn

Bernameya dîdarê wiha ye:

Ji 6 heta 11ê Gulana 2021 li kafîtîrya Şemis ya bajarê Tebqa vekirina dîdarê ye.

Sempozyom bi awayekî fermî seat 11 dest pê dike.

Ji 18 heta 31 Gulanê li navenda Mihemed Şêxo seat 11 pêşengeha salane ya pêncan wê were lidarxistin.



Herwiha rojên 18, 19 û 20ê Gulanê wê semîner werin dayîn.

Ahenga dawî roja Înê 21ê Gulanê ye.

160 hunermed tevlî dîdarê bûne.

Hunermend Sebah Elî ku ew jî yek ji hurmendên ku tevlî dîdarê bûne ji me re wiha axivî;”Ev cara yekê ye ku ez tevlî dîdareke wiha dibim. Xweşikbûneke vê dîdarê ewe ku em li kafîteryakê li ser ava Firatê kar dikin û hunermend ji hemî pêkhatiyên bakur û rojhilatê Sûrî tevlî dîdarê bûne. Wêneya ku ez çêdikim li ser jinê ye. Spasiya kome amadekar dikim û bi hêvî me her sal ev dîdar dewam bike”

## “Li çanda xwe xwedî derkevin”

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Rewan Ehmed Hefsikê diyar kir ku, gelê Rojava bi tekoşîna xwe destkeftiyên mezin bi dest xistine, ji ber wê em jî divê bi hunera xwe bibin dengê şoreşa gelê xwe.**

Her welatek bi çanda xwe tê nasîn. Di pêşxistina civakê de çand xwedîroleke giring e. Ji bo parastina çanda civaka xwe û danasîna wê, ciwanê bi navê Rewan Ehmed Hefsikê (15) yê ji bajarê Amêdê, bi stiran, awaz û hestên xwe yên welatparizî ciyê xwe di dilê gelê xwe de çêkiri ye.

**“EZÊ LI MÎRASA KEDA VAN MAMOSTEYAN JÎ XWEDÎ DERKEVIM”**

Rewan Ehmed tekildarî heskirina xwe ji hunerê û pêşxistina wê wiha axivî: “Min 2016an dest bi hunerê kir. Malbata min hiştin ku ez ji hunerê hes bikim, bavê min jî li sazê dide. Vê yekê bandora xwe pir li min kir. Ez ji mamoste Seid Yûsiv, Ayaz Yûsiv û Birader jî pir hes dikim. Ez ked û destekdayîna bavê xwe qet ji bîr nakim û ezê li mîrasa keda van mamosteyan jî xwedî derkevim. Ez hem stiran dibêjim, hemjî li sazê û erbanê didim. Min destpêkê kursa gîtarê dît, paşê berpirsiyarê navendê ez derbasî beşa dengbêjiyê kirim. Di riya Mamoste Rojîn Bîco re, ez derbasî navenda Çand û Hunera Hûrî ya bajarê Amûdê bûm. Ez derbasî koma Ş. Bêrîtan bûm , piştî demekê ez bûm endamê Koma Ciwanên Hûrî û naha ez endamê Koma Agrî ya bajarê Amûdê me. Ez beşdarî gelek festîvalên zarokan û ahengan bûm e.”

**“EM CIWAN PAŞROJA VÎ WELATÎ NE, DIVÊ EM ERKÊ XWE PÊK BÎNIN”**

Rewan wiha domand: “Dijmin ji bo ku me tine bike çand û zimanê me kir hedefa xwe. Ji ber wê mixabin hunera me pir lawaz ma ye. Lê ya ku dikeve ser milê me, ewe ku em




bi huner, çanada xwe gelê xwe bi cîhanê tevî bidin nasîn. 11 salan li Rojava gelê me destkeftiyên mezin bi dest xistine, ji ber wê em jî divê bi hunera xwe bibin dengê şoreşa gelê xwe. Ji bo wê huner ji min re giyanê gelê min e. Me bi salan ev çand bi hunerê parast û emê li ser vê yekê bidomînin. Herwiha divê em asta hunera xwe pêş bixin. Çimkî em Kurd xwediyê dîrokeke pir mezinin û bingehê tevayiya çandan ji herêmên me derketine.”

Rewan Ehmed Hefsikê axafitina xwe wiha bi dawî kir: “Banga min ji tevayiya ciwanên me re heye ku li çanda xwe xwedî derkevin. Ji ber ku em ciwan paşroja vî welatî ne, divê em erkê xwe pêk bînin.”

# Amedekariya bernameya ezmûnên refa 9 û 12an

**Desteya Perwerdê û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê, bernameya ezmûnên dawiya salê, yên refa 9 û 12an amade kir. Derbarê mijarê de hevseroka Desteya Perwerdê Rohat Xelîl diyar kir ku li gorî asta xwendekaran pirsên ezmûnê hatine amadekirin.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Cara yekê ye li herêma cizîrê ezmûnên refa 12an tê amadekirin. Herwiha Desteya Perwerdê û Fêrkirinê di sala xwendinê ya 2020-2021an de materyalên refa 12an, bi her du beşên wê yên zanistî û wêjeyî guhertin. Ji bo her pêkhateyek jî, bi zimanê dayikê ezmûn hatîne amadekirin.

Rohat Xelîl da zanîn ku ji bo pêşkêşkirina azmûnan, wan 25 dibistan diyar kirine û got; "Dibistanên me jib o ezmûnê diyarkirin; "li bajarê Qamişlo, Girkê Legê, Dirbêsiyê û Hesekê ne. Hejmara xwendekarên me li herêma Cizîrê yên refa 9an heft hezar, yên refa 12an jî çar hezar in. Ji bo çûnûhatina ezmûnê jî; emê erebe ji bo xwandekarên gunda diyar bikin, lê teklîfe wê li ser malbatan be. Divê xwendekarên li gundan zû derkevin, da ku li wan nebe dereng û di saeta ezmûnê de



her kes hazir be".

Rohat demê ezmûnên herdu refan bibîr anîn û wiha axaftina xwe berdewam kir; "Ezmûnên refa 9an wê di 7`ê Hezîranê de dest pê bikin û di 24`ê Hezîranê de wê bi dawî bibin. Ji bo refa 12'an jî beşa zanistî wê ezmûn di 6`ê Hezîranê dest pê bikin û di 27`ê Hezîranê de wê bi dawî bibin; beşa wêjeyî jî wê di 6`ê Hezîranê de dest pê bikin û di 23`yê Hezîranê de bi dawî bibin".

**"TEVÎ BELAVBÛNA KORONA ME DEMSALA XWENDINÊ BI DAWÎ KIR"**

Rohat anî ziman ku xwendina îsal ji ya sala çûyî baştir bû û got; "Tevî belavbûna korona me demsala xwendinê bi dawî kir. Dema dawî, ji ber qedexeya giştî, çend wane nehatin bi dawîkirin. Lê ji bo ku bêmafî li xwendekaran neyê kirin, me navendên perwerdê vekirin e. Li van navendan hem waneyên nehatîn dayîn, hem ji tiştê nehatiye fêmkirin wê ji xwendekaran re werin dubarekirin. jixwe pirsên ezmûnê yên ku me hilbijartine, ne zehmet ne jî hêsan in. Me li gorî asta xwendekaran amade kirine."

Ruhat ji bo parastina xwendekaran ji nexweşiya korona (Covid-19), wiha axifî; "Me li her dibistanekê du mamoste berpirsên tenduristiyê erkedar kirin e. Emê tedbîrên pir cidî bigrin, wê her xwandekarek masik û lepika bikar bîne. Di refan de jî, wê dûrbûn di nava xwendekaran de hebe, her xwendekarek wê di maseyekê de cih bigre."

Rohat da xuyakirin ku wan ji destpêka salê de, 3 komîte ji bo amedekariyên ezmûnê ava kirine û wiha pê da çû; "karê her sê komîteyên me cuda ye; Komîteya yekê ji bo amadekirina pirsan e, ev komîte hemû nimûneyên pirsan ji herêman werdigirin û di dawiyê de nimûneyeke baş di hildibijarin, ya duduyan ji bo diyarkirina navendên ezmûnan e, ya sisiyan jî ji bo amadekirina bawernameyên xwendekaran ne."

Girêdayî pileyên xwendekaran Rohat destnîşan kir ku sîstema wan li ser nirxandina xwendekaran di dirêjahiya salê de ye û gotinên xwe wiha bi dawî kir: "Ji bo refa 9`an 50 pile li gorî asta xwendevan di dibistanê de tê esasgirtin û 50 pileyên din jî li gorî ezmûna dawiya salê ye. Ji bo pileyên refa 12'an jî ezmûna dawiya salê tê esasgirtin".

# "Çiqas zext pir be, dê berxwedan bilindtir be"

**Idrîs Henan**

Mihemed Ebdo û Arîn Elî bal kişandin ser cewherê êrişên dagirkeriyê û tekez kirin, ku hemû êrişên li ser çar parçeyên welêt, konsepta şer ya bi armanca qirkirina kurdan e. Her wiha destnîşan kirin, ku dagirkerên Kurdistanê wê nikaribin bi van şêwazên dermirovî vîna wa têk bibin.



**"BI TÊGÎNA KEDXWARINÊ XWE MEZIN Û MAYÎNDE DIKE."**

Hevcîgirê Meclîsa Kantona Efrînê Mihemed Ebdo, bal kişand ser taybetmendiya êrişên sîstemên serdest û dewleta Tirkî weke mînak bi bîr anî û got: "Hegemonî bi têgîna kedxwarinê, xwe mezin û mayînde dike. Keda civakan diçewisîne û bi rêbazên qirker êrişên tunekirinê dike. Îro êrişên ku li ser Herêmên Parastina Medya, di şexsê Gerîlla de li gelê kurd dike. Ji ber ku bi zendên wan, gelê kurd yê li ber keviyan hatîn qelandîn tê parastin. Ev êrişe naveroka hişmendiyê faşîzma Tirkî diyar dike. Li ku têgîneke demokrasiyê hebe, dijbertiya wê dike. Êrişên li ser Rojava, Bakur û Rojhilatî Sûriyê vê yekê baş diyar dikin."

**"ÊRIŞ BI ARMANCA PARÇEKIRINÊ PÊK TÊ!"**

Ebdo diyar kir ku Îro dagirker hewil didin, ku hêza ku civakê diparêze tûne bike û wiha pêda çû: "Tevî nakokiyên navbera hêzên dagikerên li Kurdistanê, di dijminatiya ji îradeya avaker a gelan re hemfikir in. Lê bi yekîtiya hêza kedkar a parêzvanê azadiyê re, dijminê xwînxwar li her derê derbên giran dixwe. Êrişên hemwext yên li Başûr, Rojava û Bakurê welêt, hewldanek cidî ya kolekirina civakê ye. Mejiyê wan xwe ranagire, ku li cihekî edalet, azadî û wekhevî hebe" .

**"ARMANC YEK E"**

Ebdo êrişên dagirkeriyê û dûvikên wan li hemû devaran weke yek konseptê pênase dike û wiha dibêje: "Provakasyonên li Qamişlo, êrişên li ser Eyn Îsa, Şehba û Herêmên Parastina Medya di çarçoveya heman projeyê de ne. Hewl didin heya Şengalê werin, ku careke din Kurdistanê parçe bikin û dixwazin têkçuyîna xwe ya di şexsê çeteyên DAIŞ de, telafî bikin. Di heman demê de bizaveke qirker a têkbirina destkeftiyên Kurdan li her derê ye."

**"ÊRIŞ LI SER HEMÛ KURDAN E"**

Endama Meclîsa Kantona Efrînê Arîn Elî jî, êriş şermezar kirin û wiha got: "Êrişên li ser qadên Gerîlla, di cewherê xwe de, êrişa li ser hemû Kurdan e. Lewra jî berxwedan para her Kurdekî ye. Çi bûyerên li Rojava, Başûr, Bakur û Rojhilatî Kurdistanê biqewimin,



bi destê hemû hezên dagirker e. Hewldanek têkbirina vîna azadî, demokrasî û jiyana hevbeş e".

**"QUTKIRINA AVÊ SÛC E"**

Arîn qutkirina ava Firatê jî bi bîr xist û bal kşîne li ser kiryarên ku bi hemahengiya hêzên dagirker û wiha got: "Li gorî hiqûqa navneteweyî qutkirina ava Firatê sûcek li dijî jiyana mirovan e. Ti mafekî faşîzma Tirkî nîne, ku para Sûriyê ji ava Firatê qut bike. Îro ev kiryar li ber çavên hemû dunya, sazî û dezgehên pêwendîdar pêk tê. Bêdengiya wan jî şirîkatiya hewldanên qirker ên faşîzma Tirkiyê ne."

**"HÛN NIKARIN VÎNA ME TÊK BIBIN"**

Endama Meclîsa Kantona Efrînê Arîn Elî, di dawiya gotinên xwe de îşaret bi siyaseta faşîst a dewleta Tirkî kir û got: "Ji şidandina tecrîda li ser Rêbertiyê bigire û heya zextên li zîndanan; êrişên li Başûr, Bakur û Rojava, hemû jî bi mebesta qirkirina gelê azadîxwaz e. Em weke şêniyên Efrînê ji dagikerên Kurdistanê re dibêjin; 'hûn nikarin bi van kiryarên xwe vîna me bişkînin. Çiqas zext pir be, ewqas asta berxwedana me jî dê bilindtir be."


# Şehîd Mistefa: Divê em bi perwerdeyê nifşeke welatparêz bigihînin

**Hediya HISÊN/Qamişlo**

Şehîd cangoriyê welat , dîrok û mafê gelê xwe ye û li nerxê azadiyê xwedî derdikevin. Gelên bin dest bi saya keda şehîdên xwe dibe xwedî nasname. Şehîd Mistefa jî lehengek ji lehengên tekoşîna çiyayên Kurdistanê yên azad e. Bi xebata xwe, destaneke serfiraziyê ji dîrokê re hişt.

**DARA AZADIYÊ BI XWÎNA ŞEHÎDAN TÊ AVDAN**

Şehîd Mistefa di malbateke welatparêz de, di sala 1962an li Qamişlo ji dayîk dibe. Ji temenê xwe yê biçûk ve, bi kesayeteke aram û jîr tê naskirin. Ji ber xizaniyê nikare dibistanê bi dawî bike û di refa 9an de, dest bi kar dike. bi temenke



biçûk dizewice û dibe xwediyê 4 zarokan (Rêzan, Rêber, Mezlûm, Egîd). Bi çirûska fikir û felefiya Rêber Ocelan li rojavayê Kurdistanê, Şehîd Mustefa nêzîkî PKKê dibe û mala xwe dike qadek ji qedên xebatê. Bi rengeke rêxistinî weke endamekî çalak di nava partiyê de xebat dike.

**"EGER EM PARASTINA XAKA XWE NE KIN WÊ KÎ BIKE!"**

Sala 1986an, Mistefa biryara tevlîbûna PKKê dide û bi komek hevalên xwe re, diçin Libnanê û perwerdeya xwe li wir dibînin . Pişt re jib o xebatan vedigere Qamişlo û li vir 4 salan xebatên gel dimeşîne. Fikr û şoreşa azadiyê, di nava gel de belav dike. Sala 1989an jî, diçe çiyayê Kurdistanê û xebata xwe li wir dewam dike. Herwiha birayê wî Îsa jî heman biryarê dide û ew jî tevlî refên gerîla dibe. Şehîd Mistefa, kêfxweşiya xwe ya ji bo tevlîbûna birayê xwe, bi nameyekê ji bavê xwe re nîşan dide. Di nameyê de dibêje; "Ez kêfxweş im ku birayê min jî derbasî çiya bûye. Emê pişta xwe bidin hev û emê şerê dijminê kurdan



bikin. Li min bibûrîne, ji ber ku min barê te giran kir, lê ku em neçin û perastina xaka xwe nekin wê kî bike!"

Şehîd mistefa girîngiya perwerdeya welatparêzî teqez dikir û wiha digot "Divê zarokên me perwerde bibin, bila nifşeke welatparêz were afirandin. Divê nas bikin ku welatê me bi zorê hatiye dagîrkirin, emê bi zorê jî rizgar bikin."

Şehîd Mistefa bi nerxên hevaltî û hezkirin xwe ya cevherî dihat naskirin. Dema ku Partî biryar dide, ku li herêma Xerzanê jî bi cih bibe, di sala 1991an de Mistefa bi komek hevalên xwe re, berê xwe didin Xerzan'ê. Di heman sale de, li wir leşkerên dijmin erişî wan dikin û di sê çeperan de şer derdikeve. Ji ber ku şer giran dibe, du heval şehîd dikevin û Mistefa jî birîndar dibe, ji hevalên xwe re dibêje; 'xwe xilas bikin ezê pişta we biparêzim' lê hevalên wî ev yek qebûl nekirin û bi hevre li hember leşkerên dagirkeran şer kir. Piştî berxedaneke mezin, di wî şerî de Mistefa û hevriyên xwe tevlî karwanên nemiran dibin.

Şehîd mistefa berî ku şehîd bikeve ji hevalên xwe re dibêje bila zarokên min bi perwerdeyeke wealparêziyê mezin bibin û rêka bavê xwe bişopînin. Di konê wî de hevjîna wî jî soz da ku heta dawiyê wê têkoşîn bike û li ser rihê berxwedanê zarokên xwe mezin bike.

Hevjîna şehîd Mistefa, Necah Gulo li ser şehadet şehîd Mistefa û jiyana zarokên xwe axivî û wiha got; "Hevjînê min bi serfirazî tevlî refên bakrewanan bû, lê zarokên min ji zilma rêjîm Şamê xilasnebûn. Gelek caran destgîr dibûn û bi mehan di zindanê de diman, gelek caran jî êrişî mala me dibû û dîmenên rêbertî û yê şehêdan giş dibirin. Me soza xwe daye ku ez û zarokên xwe şopedarên rêka şehîdan bin û ez xwediya soza xwe me."



# "Ev êriş ji bo tinekirina destkeftiyên gelan û jinê ne"

**Li seranserê Kurdistanê û çiyayên berxwedanê ku şoreşê pênase dikin, bênavber êriş li ser tên kirin. Li ser vê yekê Leyla Îbrahîm diyar kir, ku armanca sereke ya Tirkiyê ji van êrişan, qirkirina gelê Kurd e. Herwiha got, ku êrişên tên kirin ne li ser PKKê tenê ne, li ser tevayiya gelê Kurd in. Lewre têkoşîna PKKê bi fikir û felsefeya Serok Apo hatiye avakirin û destkeftiyên jin û gelê Kurd jî li ser haman fikrê hatine bidestxistin.**

**Leylan RESO/Qamişlo**

**"GELÊ ŞINGALÊ HER DEM DI NAVA PARASTINA XWE DE YE"**

Têkildarê mijarê, hevseroka Mala Êzîdiyan ya Herêma Cizîrê Leyla Ibrahîm Mehmo bal kişand li ser êrişên Şingalê û wiha got: "Planên ku li ser Şingalê tên kirin ne ji nûve ne, bi sed salan e. Bexda û Hewlêr bi alîkariya dewleta Tirkî van pilanan li ser xelkê Şingalê dimeşînin. Armanca wan qirkirina xelkê Êzîdî ye. Lê çiqas êriş bi ser gelê Şingalê de bên ,ew her tim li ber xwe didin. Xelkê Şingalê ne yê 2014an e, ew niha bûne xwedî hêz."

**"HERÊMA METÎNA XETA DERBASBÛNA QENDÎLÊ YE"**

Leyla diyar kir ku Metîna herêmeke stratejîk e ji bo PKKê û dewleta dagîrker hewl dide bi avakirina baregehên serbazî, tevgera gerîlayên PKKê ya di navbera Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê de qut bike û wiha pêda çû: "Herêma Metîna girîng e. Armanca dewleta Tirkî ewe ku li ser vê yekê li Sûriyê jî baregehên xwe ava bikin û deverê dagir bikin. Herwiha ev herême xeta derbasbûna Qendîlê ye û dixwazin vê xetê jî dagîr bikin."

**"HÊZÊN NAVNETEWEYÎ LI DIJÎ ÇEKÊN KÎMYAYÎ BÊDENG IN"**

Leyla Mehmo di nava axaftina xwe de bang kir, ku divê gelê kurd ji kompoyên ku li dijî vîna wê têne plankirin hişyar be û wiha pêda çû : "Hikumeta faşîst ya Tirkiyê her dem li dijî vîna gelan, siyaseta xwe ya dijminanî dike. Bi çekan înkara hebûna gelan dike û hişmendiya qirkirina galan dewam dike. Êrişên wê yên li dijî herêmên Zap, Metîna û Avaşînê bi çekên kîmyayî pêk tine, ku ev dewlete endamê NATO ye! Li hemberî van êrişan bêdengî ya dewletên navneteweyî bi guman e. Ji vê zêdetir jî, li hemberî berxwedana gelê me yên ku bi xaka xwe ve girêdayî, hemû cureyên çekan, ku di nava dewletên navneteweyî de qedexe ne tên bi karanîn û liberanberî vê yekê bêdengî heye. Lê belê hêjayê bîranînê ye, ku li Garê û herêmên din, li hemberî van êrişan berxwedana HPH û YJAStar bi lehengî dagirker bin xistin. Em bang li gelên xwe û tevahî jinên azadîxwaz dikin ku li dijî vê dagirkeriyê bisekinin û em bang li hikumeta Iraqê û hikumeta Başûrê Kurdistanê bikin ku bi erka xwe rabin, ta ku parastina sînoran ji xeteriya armancên qirêj yên dewleta Tirkî derkeve."



# "Emê Tecrîdê bişkînin û Rêber Apo azad bikin"

**Jiyan BOZO/Qamişlo**

**Peyama dayîkan ji gerîlayên 'berxwedana Zagrosê re': Di nava wê zilm û zorê de we serî dananî. Em jî li dû şopa we ne; heta şkandina tecrîdê û azadkirina rêbertiya xwe, emê jî di nava têkoşînê de bin.**

**"RÊBER APO HEBÛN Û NASNAMEYA ME YE"**

Welatiya bajarê Amûdê Şîrîn Yûsiv Xelîl derbarê tecrîda li ser Rêber Apo wiha axivî: "Rêber APO hebûn û nasnameya me ye. Armanca dewleta Tirk ji tecrîdê, tinekirina azadî û vîna me ye. Rêber APO ne rêberê gelê Kurd tenê ye, xwediyê projeya Neteweya demokratîk û afrînerê jiyana azad û hevbeş li Kurdistan û Rojhilat Navî tevê ye. Azadiya Rêber APO azadiya me jinan e. Em xwediyên vê şoreşê ne û deyndarên rêbertiya xwe ne. Heta em vê tecrîdê bişkînin emê li ser piyan bin û tekoşîna xwe xurttir bikin. Li ser vê bingehê banga min, ji jinan tevan re heye. Rêber APO em bi îrade û xwedîmaf kirin. Divê em jî li keda wî xwedî derkevin, tecrîdê bişkînin û rêbertiya xwe azad bikin."

**"BERXWEDANA WAN LEHENGAN SILAV DIKIM"**



Edîba Mihemed Elî ya dayîka gerîleya YJAStar'ê têkildarî tecerîda girankirî û êrişên dewleta Tirkî a dagîrker li ser herêmên parastina medya ev nirxandin kirin: "Di serî de em vê tecrîdê şermezar dikin. Di van salên dawiyê de dewleta tirkî ya dagîrker tecrîda



li ser rêbertiya me girantir dike. Ji sala 2019an ve ne parêzeran hevdîtin pê re kiriye, ne jî malbatê. Ji ber wê, ji 25ê Adarê ve fikarên me zêdebûn e. Çimkî hêrsa rêber Apo di asta herî jor de bû. Gelo li Îmralî çi dibe? Dixwazin vîna me bişkînin, lê em ne ew Kurdên berê ne ku em ji wan re serî daynin. Ji bo azadiya serokatiya xwe em amadene ku canê xwe jî bidin."

Edîba Mihemed Elî axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Êrişên li ser herêmên parastina medya berdewamiya heman tecrîdê ye. Dewleta tirkî bû ye gûrê nav pez, êrişî her derê dike û ji xwîn têr na be. Lê ew nizane ku zarokên me xwediyê vê xakê ne, ji ber wê jî ti carî ji wan re serî danayînin. Ez ji dil berxwedana wan lehengan silav dikim û ji wan re wiha dibêjim: Di nava wê zilm û zorê de we serî dananî. Em jî li dû şopa we ne û heta şkandina tecrîdê û azadkirina rêbertiya xwe emê di nava têkoşînê de bin."

# PAJK'ê hozan Mizgîn û şehîdên meha Gulanê bîr anîn

**Tevgera Çanda Jinên Kevana Zêrîn ya PAJK'ê bi peyamekê şehîdên meha Gulanê û şehîd hozan Mizgîn bîr anîn û diyar kir ku "Di roja me ya îro de li Kurdistanê di hemû helbest, stran û kilaman de şopên hevrê Mizgîn hene."**

Di peyamê de wiha hate gotin: "Meha Gulanê meha şehîdan e, destanên qehremantî di vê mehê de tên nivîsandin. Şehîdên şoreşger ev meh bi xwîna xwe av da û bi xwîna wan gulên Gulanê vebûn. Bi wesîleya salvegera şehadeta şoreşger hozan Mîzgîn li hemberî hemû şehîdên şoreşê em bi rêzdarî bejna xwe ditewînin. Di dîroka têkoşîna me de, di vê mehê de, qehremanên şehîd ji bo azadiya mirovahiyê, bedelên giranbuha dane. Şehadeta Hozan



Mizgîn, Haqî Karer, Xalîl Çavgun, Mehmet Karasungur, Îbrahîm Bîlgîn hişt ku ev meh di Kurdistanê de bibe bingeha jiyana nû. Dîsa di vê mehê de Şîrîn Elemhulî, Ferzad Kemanger, Ferhat Wekîlî, Alî Heyderyan û Mehdî Îslamiyan hatin darvekirin. Şewazê şehadeta van hevalan li hemberî têkoşîna azadiyê tirsa desthilatdaran nîşan dide. Di heman demê de di vê mehê de qehremanên şoreşger, Denîz Gezmîş, Yusuf Arslan, Hûseyîn Înan bi silogana 'Bijî biratiya gelê Kurd û Tirk' ber bi kûrsiya îdamê ve meşiyan û gihîştin şehadetê. Mîrasa şehîdên şoreşger, wek lehiyekê ber bi roja me ya îro ve diherike.

Di 11'ê Gulana 1992yan de hevrê hozan Mizgîn, di bin dorpêça dijmin de têkoşîn û fedaîtî, pêwîste çawa were meşandin nîşanî me daye. Li hember rastiya mirovê ku ji çand, ziman, dîrok, ax û welatê xwe xerîb ketiye, têkoşîna vegera li cewher û axa xwe bi çanda xwe re yekbûyînê dide raber kirin. Di heman demê de hozan Mizgîn bûye kesayeteke pêşeng û hunermend û li ziman û çanda kevnar xwedî derketiye. Pabendiya azadî û nasnameya jina berxwedêr di şexsê xwe de jiyanî kiriye. Di vê wateyê de heval Mizgîn li hember qirkirina çandî, sekneke dîrokî ye. Di roja me ya îro de li Kurdistanê di hemû helbest, stran û kilaman de şopên hevrê Mizgîn hene. Li hember dagirkeran bi şerê xwe huner afirand. Bi hezaran jin bi navê Mizgînê ber bi refên azadiyê ve meşiyan û di şexsê hozan Mizgîn de fermandariya şer û hunera azadiyê mezin dikin.

Bi wesîleya 11'ê Gulanê 'Roja Bîranîna Şehîdên Çand û Hunerê' em jî wek şopdarên pêşeng Mizgîn, Sefqan, Sîpan, Sarya, Berçem, Xelîl, Delîla, Ronahî û Yektayan, biryardariya bilindkirina têkoşîn û hunera azadiyê didin. Di serî de em bang li hemû hunermendên Kevana Zêrîn û rewşenbîrên din dikin, ku bi şêwazê derwêş û zanyaran, bibin deng û hunerê çanda jiyana azad. Huner bi têkoşînê tê xemilandin. Bi soza kû emê bi guhertin û veguhertinê jiyana nû biafirînin û pîvanên civakbûyînê bidin rûniştandin, em hemû şoreşgerên ku di meha Gulanê de şehîd ketine, bi taybet salvegera 29an ya şehadeta şehîd Mizgîn (Gurbet Aydin) de careke din bi nasnameya jina gerîla ya hunermend bi bîr tînin û bejna xwe li hember hemû şehîdan ditewînin."

*ANHA*

# Kurdistaniyên başûr: PKK Parêzvana kurdayetiyê ye

Azad Îbrahîm: Divê helwesta gelê Kurd bi qasî êrişan dijwar be; berxwedana gerîla bi dengekî bilind bê pîrozkirin û divê em dijmin têk bibin.

**Serbest EHMED/Qamişlo**

Li dijî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên li ser herêmên Parastinê yên Medya; siyastvan, rewşenbîr û çalakvanên başûrê Kurdistanê nerazîbûna xwe nîşan dan. Herwiha berxwedana hêzên gerîla û YJA star jî pîroz kirin.

**"ERDOGAN SERWERÎ Û ARAMIYÊ HERÊMÊ TÊK DIDE"**

Çavdêrê siyasî yê başûrê Kurdistan Reuf Şêx Burhan diyar kir, ku êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker li dijî zagonên navneteweyî ne. Herwiha pêvîstiya şkestina bêdengiya cîhanê bi lêv kir û wiha pêde çû:"Êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker yên li ser başûr, binpêkirineke ji zagonên navnetewî re ye. Ji ber êriş û projeyên Tirkiyê, rojbiroj serwerî û aramiya li herêmê ber bi xerabiyê ve diçe. Hem Tirkî êriş û baregehan zêde dike, hem tevgera çeteyên DAIŞê bê sînor dibe û xetera wan pirtir dibe. Ji xwe êrişên DAIŞê yên vê dawiyê, nameya Tirkiyê ye



ji hikumeta Iraqê re. Armaca wê jî bêdengkirina Iraqê ye."

**"DIVÊ CÎVAKA NAVNETEWÎ LI HEMBER VÊ QIRKIRINÊ XWEDÎ HELWES BE"**

Reuf Şêx Burhan herwiha bal kişand li ser armanca êrişên qirkirinê û got: "Erdogan pirsgirik û şkestinên xwe yên li derve û hindir dixwaze, bi êriş û qirkirinê çareser bike. Pêvîste hikumeta Iraqê mafên xwe weke endama Neteweyê Yekbûyî bi kar bînin û herdu hikumetên Iraq, li hemberê êriş û qirkirinê ji qalibê xwe yên tirsa şermok de derkevin. Li dijî dagîrkeri ya welatê xwe bisekinin. Divê civaka navneteweyî jî li dijî êriş û sûcên tirkiyê xwedî helwestek be. Êrişên li ser PKKê, êrişên li ser gelê kurd bi tevahî ne."

**"DAGÎRKER BI ÊRIŞÊN XWE HEBÛNA GELÊ KURD DIKE ARMANC"**

Herwiha nivîskar Azad Ehmed derbarê êrişan de, nerazîbûna xwe û ya gelê Başûr wiha nîşan da: "Helweste gelê me, ji mêj ve diyar e û nerazîbûna xwe bi çalakiyan nîşan dide. Gelê başûr dizane ku yê êriş dike dijiminên gelanin û wê welêd dagîr bikin. Dewleta Tirkî bi hemû hêz û çekên xwe li dijî kurdan bi kar tîne. peroje û berjewendiyê wê jî kevnar in. Gelê Kurd li ku derê be, di çi demê de be, wê bibe armanca êrişên wê. Çand, dîrok, hêz û destekeftiyên gelê kurd jî li her derê dibin armanca vê dewleta faşîst."

**"GELÊ BAŞÛR BI PROPAGENDA DESTHILATÊ NAYÊ XAPANDIN"**

Azad Ibrahîm helwesta partiyên başûr di derbarê êrişan şermezar kir û gotinên xwe wiha bi



dawî kir: "Hewlesta rewşenbîr, nivîskar û civaka başûr zelale. Lê hin paritiyên kurdî, ji bo berjewendiyên xwe dixwazin bêdengiye li ser gelê me farz bikin. Ew partî yan bê helewst dimînin, yan jî bi helwest û bernamiyên xwe dikevin bin xizmeta projeyên dewleta Tirkî ya dagîrker de. Gelê başûr bi propaganda desthilatan nayê xapandin, çalakiyên nerazîbûna gel dewam dikin. Piştgiriya xwe ji tevgera azadîxwaz û Hêzên Gerîla nîşan didin. Lê divê bertekên gelê kurd biqasî êrişên Tirkiyê dijwzr bin, divê vîna gelê kurd êrişan bişkîne û li ser asta cîhan jî xebat û têkoşîna xwe xurtir bike."

# "40 sal in tecrûbeya dewleta tirkî ya binkeftinê heye"

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Endam û rêveberê Nivîsgeha Rêxistinî ya MSD`ê Ammar Mûsa, têkildarî armanca dewleta Tirk ji êrişên li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê ji rojnameya me re nirxandinên xwe kir.

**"DI NAVA DU SALAN DE DİXWAZE DAGİRKERİYA XWE BERFİREH BİKE"**

Ammar destnîşan kir ku dewleta Tirkî hebûna xwe li ser dagirkirina gelan û Kurdistanê dide avakirin, teybet jî wek nexweşiyekê di tûnekirina kurdan de hebûna dibîne. Herwiha teqez kir, ku PKK berîya 40 sali ji bo pêşî girtina qirkirina gelê Kurd xwe rêxistin kiriye û êrişên hovane yên faşîzma Tirkî nikare pêşî li tekoşîna azadîya kurdan bigre. Îmad Mûsa peymana Lozanê bi bîr anî û wiha berdewamî da gotinên xwe: "Em nêzî peymana Lozanê ya 1923`an ku dewleta Tirkî divê peymanê de îda dike ku xaka wê jê hatiye standin. Ji



ber wê jî, di nava du salan de dixwaze dagirkeriya xwe berfireh bike. Da ku di sedsaliya Lozanê de, rewşeke nû ferz bike. Ji ber wê jî destwerdana Lîbya, Tûnis, aloziya Sûrî, Iraq, Yewnanistan, Qubris û heta rojhilata deryaya Spî êrişên xwe berfireh dike."

**"40 SAL IN TECRÛBEYA DEWLETA TİRKÎ YA BİNKEFTİNÊ HEYE"**

Îmad got ku dewleta Tirkî ji ber êrişên xwe yên her deverî ji alîyê aborî û siyaseta xwe de bi qeyrana hilweşandina xwe ve birûbrû ye. Herwiha da nişandan, ku bi êrişîn xwe yên hovane li ser gerîlayên azadiyê, dixwaze qeyrana xwe ya hundirîn biveşêre û wiha berdawam kir: "Dijminê faşîst çiqas êriş jî bike, dizane ku hêzên gerîla tu carî paşde nakevin û têk naçin. Ji ber ku 40 sala tecrûbeya binkeftina dewleta Tirkî, li hember gerîlayê azadiyê heye"

**"DÎROK WÊ HESABÊ Jİ WAN BİXWAZE"**

Mûsa yêkitiya netewî teqez kir û wiha pêde çû: "Divê berjewendiyên partiyan û eşîran werin paşguhkirin û divê her tim berjewendiyên gele Kurdistanê bê esas girtin. Gelê Kurd di dîrokê de bi qehrematiya xwe tê naskirin û ji ber wê jî, her tim di aliyê leşkerî de bi ser dikeve. Lê di aliyê siyaseta xwe ya hundirî de winda dike. Ji ber ku hin alî hebûn, bi ajindeyên xwe yên partî, eşîrtî, malbatî û herêmkî ve girêdayî bûn. Mixabin van kesîma hebûna xwe bi kêleka dagirkeran ve didîtin. Wê kesîmê, ti car nûnertiya gelê Kurd nekiriye û nakin. Lewra dîrok jî wê hesabê ji wan bixwaze."

Di dawiyê de Endamê Nivîsgeha Rêxistinî ya MSD`ê Îmad Mûsa ev tişt anî ziman:"Her tim di nava gelan de beşek heye ku hebûna xwe bi dagirker û dijminê gele xwe ve dibîne. Ev xalek sereke bû, ku gelê Kurd di nava sed salên dawî de mafên xwe misoger nekir. Qehremantiya hêzên gerîla, xeta yekemîn ya parastina nirx û destkefiyên gelê Kurd e. Divê em li her çar parçeyên Kurdistanê, serkeftinê misoger bikin. ji bo wê jî divê gelê Kurd, çi li hundir û çi li derveyî welêt rola xwe pêk bîne û partiyên siyasî jî berjewendiyên teng bidin aliyekê û berjewendiya gelê Kurd esas bigrin. Ev ji bo me derfeteke dîrokî ye û di sedsala bê de armancên gelê Kurd dê pêk werin."



## Faşîzma AKP-MHP'ê diheje!

**Ahmet AKTAŞ**

Bêgûman her kes zane, R.Erdogan û Bahçeli, ji bo desthilatî ji dest wan neçe, eyb û uzrê wan aşkere nebe, heta ku derfet hebe ji hev naqetin. Lê di van kêliyên dawî de, hinek nîşanên ku peywendiyên wan ber bi xerabûnê diçin tên dîtin.

Mînak a ragihandina Bahçelî ya makezagonê. Her wiha dirûşma "MHP ber bi desthilatiye dimeşe" û hwd. Heta niha dihat zanin ku stratejiya Bahçeli, bêyî ew bixwe an hinek hevalên xwe bixe rêveberiyê, li paş perdê hemû daxwazên xwe bi AKP'ê bide meşandin bû. Lê hema di van mînakan de jî aşkere tê xuyakirin ku ji bo dema pêş, dixwaze êdî yekser û aşkere bibe hevparê R.Erdogan an bi giranî êdî li şwûna AKP'ê, MHP'ê rêveberiya desthilatiyê bixe destê xwe.

Bûyera van rojên dawî ya daxwiyaniyên Sedat Peker jî gelek balkêş e. Aşkere êrîşên giran dibe ser Mehmet Agar-Aladin Çakici. Diyar dibe ku hevalbendên wan ên "rêxistinên sûc/karê qirêj û kujeriyê" jî bi hev ketine. S.Peker, serkêşê koma li gel R.Erdogan e. M.Agar-A. Çakici jî serkêşên koma li gel Bahçelî ne.

Di nakokî û pevçûnên van koman de, yê xwe xurt nîşan dide û ji aliyê raya giştî ve jî bi giranî wisa tê dîtin, aliyê MHP'ê ye. Jixwe S.Peker, berî salekê revyabû derve û berî çend rojan ji koma wî gelek kes, ji aliyê polis-jandarma ve hatin girtin. Jixwe ew daxwiyaniyên wî yên ewqas tûj li ser van girtinên hevalên wî bû.

Eger ev nakokiyên navbêna wan, gihiştibin vê asta ku ewqas bi gotinên giran fort û gefan li hev bixwin, ne dûr e ku di nêz de Bahçelî bêje "em diçin hilbijartênên pêşwext"! Ev gûman, di raya giştî de xurt e, lê şîroveyên cudatir jî û bahsa hinek şêwazên xerabtir jî; weke kotekî/zorî jî tên kirin!

Armanca lezgîn a bi hinek dewletan ra, neyartiyê rake "dostayê" bide avakirin, her wiha êrîşên girantir dibe ser Başûr; Metîna, Zap, Avaşînê û Rojava û hwd. vana hemû, ji bo desthilatiya xwe ya li hundûr ku êdî diheje û ber bi hilweşandinê diçe, li ser piya ragire û hinekî temenê rêveberiya xwe dirêj bike. Lê şerd û mercên heyî, wê şensê nade R.Erdogan. Ji ber ku ew maseya çareseriyê ku pêna xwe lêda qeliband, gelê kurd giran birindar kir û êdî nema dikare wan birîna derman bike. Her wiha nikare birînê xwe jî derman bike, ji ber ku birînê wî girantir û bêçaretir e; wî jenosîda gelan û baweriyan ji xwe re kir armanc, ev sûcekî gelek giran e û ji vêna re lêborîn nabe.

Jixwe li Heftenînê û Garê derbeyên mezin xwarin. Li goreyî, bi giştî daxwuyaniyan, ew ê di vê êrêşa gelek berfireh û bi hêza giran li Başûr û bi taybetî li ser Qadên Parastina Medya dide meşandin jî, derbeyê mezintir bixwe. Jixwe tê pêşbînîkirin ku ev êrîşa wan a dawîyê, ya mannemanê ye!

Li gel ku hemû kevneperestiya cîhanê û ya kurdî jî piştgriyê didê, heta nuha ew serkeftina ku dixwest bi dest nexistiye. Ji ber ku berxwedanek lehengî ya dîrokî li dijî wan tê kirin. Her wiha, çendîn ne li goreyî tê xwestin be jî, hilwestek ji berê xurtir a gelê Kurdistanê û dostên xwe yên navnetewayî jî bi giştî heye.

Bêgûman ev faşizma AKP-MHP'ê, êdî nikare xwe ragire; zû-dereng her dişkê/dirûxe. Hilbet ji bo serkeftinek nêztir û mezintir, piştgriyek xurtir û berfirehtir a neteweyî û navneteweyî divê.

9.5.2021

TÊBÎNÎ: Min di nivîsa hefteya derbasbûyî de, şaşiyek teknîkî ya dîrokê kiribû. Sererast dikim û lêborinê ji xwendevanan dixwazim: Li şûna 1908-1912-1913-1914'an, 2008-2012-2013-2014'e hatibû nivîsandin!



# "Ew rêberê azadî, mirovayî û wekheviyê ye"


Şêniyên Qamişlo: Dagîrker dixwazin bi tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan, vîna gelê Kurd bişkînin. Lewre gelê Kurd û gelên cîhanê yên bindest fikir û felsefeya Rêber Apo esas digirin û xwe bi vê xwedîvîn dikin.

**Şivan XELÎL/ Qamişlo**

Derbarê siyaseta dewleta Tirk li dijî Rêber Abdullah Ocalan welatiyên bajarê Qamişlo ji me re axivîn.

Mamosteya zimanê Kurdî Hesîna Elî bibîr anî ku ev zêdeyî 20 salî ne, ku Rêber Abdullah Ocalan di zindana dewleta Tirk de dîlgîrtî û wiha domand: "Dewleta Tirk a faşîst derfetê nadin parêzer û malbata rêbertî ku hevdîtinê bi wî re pêk bînin. Ev yek jî li beramberî çavên cîhanê û qaşo kesên ku banga mafên mirovan dikin, tê kirin. Em vê yekê şermezar dikin. Beriya demekê jî birayê Rêbertî, Mihemed Ocalan bi rêya telefonê pêwendî pêre kir û ev jî nayê qebûl kirin. Em dixwazin hevdîtineke rewa bi Rêber Ocalan re bê kirin û rewşa wî were aramîkirin, rewşa tenduristiya wî jî were zelalkirin."

Hesîna Elî destnîşan kir, ku



deshilat ji fikir û felsefeya Rêber Apo ditirsin û wiha gotinên xwe bi dawî kirin: "Ji ber serokê me serokekî navneteweyî ye, banga neteweya demokratîk dike û armanca wî jî ewe ku gelekî azad ava bike. Lewra dîl girtîn, ku fikr û felsefeya wî belav ne be. Lê wa nikarî vê yekê bi ser bêxin. Ji ber Rêber Abdullah Ocalan tene weke fîzîkî girtiye, fikr û felsefeya wî azade. Li tevahî cîhanê û li Rojhilata Navîn fîkrê wî belav bûye. Em bang li rêxistinên hiqûqî yên navneteweyî û yên banga mafên mirovan dikin ku di demeke nêz de hevdîtin bi serokê me re were kirin, rewşa wî zelal bibe û azad bibe. Ji ber ew serokekî azadî, mirovahî û wekheviyê ye."

**"DEWLETA TİRKÎ DİXWAZE Dİ ŞEXSÊ RÊBER APO DE, Bİ FAŞÎZMÊ MİROVAHİYÊ TINE BİKE"**

Her wiha Hevserokê Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) yê Qamişlo Mesûd Ferhan wiha axivî: "Em dizanin ku tecrîda li ser Rêber APO ferz dikin, berdewamiya komploya navneteweyî ye. Rêberekî weke Abdullah Ocalan ku ji bo tevahî mirovahiyê dixebite û têdikoşe, nabe dîlgîrtiyê faşîzmê be."

Mesûd Ferhan dîyarkir, ku dewleta Tirkî dixwaze di şexsê Rêber Apo de, bi faşîzmê mirovahiyê tûne bike. Bi vê yekê dixwaze metirsiyan di



nava gelê Kurd de ava bike û îradeya wî bişkêne. Herwiha têkiliyên xurt, yên di navbera gel û Rêberê wê de qut bikin û moralên wan lewaz bikin. Gelê me jî divê bersiva vê yekê bide û rojane dakevin qadan; çalakî û xwepêşandana lidar bêxin. Heta azadiya Rêber APO em bidest nexin, divê em li ser piyan bin. Divê dewletên navneteweyî jî derbarê tecrîda li ser Rêber Ocalan bêdeng nemînin, erka xwe pêk bînin. Em bêdengiya wan şermezar dikin."

# Nadine Maenza: Sûcên Tirkiyê li Efrînê û herêmên din dewam dikin

**Navenda nûçeyan/Qamişlo**

**Nadine teqez kir ku, Emerîka li hember sûcên Tirkiyê û çeteyên wê divê helwesta xwe zalal bike û wan ji herêmên bakur û rojhilatê Sûrî derxîne. Herwiha desnîşan kir ku dewletên navnetewî jî, divê statûya Rêveberia Xweser bi fermî nas bikin.**

Sûc û kiryarên dermirovî yên bi destê dewleta Tirkî ya dagîrker li Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê li dijî sîvîlan tên kirin, rojbiroj li ber cavên cîhanê dijwartir dibin. Komîsera Desteya Navneteweyî Ya Azadiya Olan ya Emerîkayê (USCIRF)Nadine Maenza, derbarê mijarê û karê desteyê, ji rojnameya me re axivî.

**"SÛCÊN TIRKIYÊ Û YÊN ÇETEYÊN WÊ ROJBIROJ DIJWARTIR DIBIN"**

Nadine Maenza bal kişand li ser rewşa herêmên dagîrkirî û gotina xwe wiha bi rêz kir :"Li ser erdê rewşa xelkên Efrînê yên ku ji ware xwe hatine derkirin, me şopand. Li gorî şopandinê, me dît ku sûcên bi destê Tirkiyê û komên radîkal yên girêdayî wê, li dijî sîvîlan bi rêjeyeke xeter bilind dibe. Bi sed hezaran sîvîl ji warê xwe derbederbûyî ne; bi hezaran xani û bi dehan perestgehên ola êzîdî, li Efrînê hatin xerabkirin. Herwiha Li ser çeteyên Tirkiyê revandin, Kuştin, Destdirêjî û desteserkirin dewam dike. Di rapora me ya salane de, rewşa herêmên di bin serweriya Tirkî û çeteyên girêdayî wê de, me bi rewşeke xeter nirxand. Ev sûc ne tenê ji aliyê me ve hatin piştrastkirin. Herwiha ji aliyê Rêxistinên Mafê Mirovan yên navneteweyî tevan jî, ev sûc hatin teqez kirin."

**"BERÊ DEMOKRASÎ HEBÛ NIHA JÎ SÛCÊN DAGIRKERAN HENE"**

Nadine di axaftina xwe de nîşan kir ku, rewşa herêmên dagîrkirî ji Kongrês û Serokê Emerîka ragihandiye û li gorî rewşa pêwîst, gelek pêşniyar



li hikumeta Emerîka kirine û wiha pêde çû: "Li herêmîn din yên bakur û rojhilatê Sûriyê jî, me hin civîn û hevdîtin çêkirin. Lê baweriya gelên herêmê bi siyaseta Emerîka re nema ye û mafdarin jî. Biryara Baydin di derbarê kumkujiya Ermenan de, diyardeyeke baş e ji bo netew û pêkhatiyan. Jixwe gelên cîhanê giş, dizanin ku QSD li hemberê çeteyên DAIŞê pêşengtiya cîhanê di şer de kir û ev yek jî cihê rêze ye. Lê divê em çavê civak û saziyên cîhanê vekin ku ji bilî serkeftina şer, ev pêkhatiye nimûneke ji demokrasiyê re û wekhevi ava kiri ye. Divê cîhan bizane ku, berîya dagîrkirina van herêmên ku niha lê sûc tên kirin, bi rengekî demokrasî ji aliyê gelê xwebixe ve dihatin rêvebirin."

## Sûriye li çareserî û demokrasiyê digere

**Zekî BEDRAN**

Li Rojhilata Navî pêvajoyeke ronakbûn û reforman çênebû. Ji ber wê baweriyên çandî yên olî û tevgerên miliyetgir yên dewlet-neteweyan pêş xistîn serdest bûn. Navendên hişk yên dewlet-neteweyan bû sedem ku hişmendiya yekperestî û rejimên otorîter bibandor bin. Ji ber ku hêzên hundir pêş neketin û têkoşîna îdeolojîk, demokratîk û çînayetî lewaz man, karê rejimên otorîter hêsan bû. Destwerdana dewletên mêtîger û emperyalîst ya herêmê, herwiha sepandinên kapîtalîzmê nakokî kûrtir kirin. Têkiliya van rejimên zordar yên hevkariya bi emperyalîzmê re wisa kir ku temenê wan dirêj bibe. Nerazîbûna gel ya 2010an ya girseyî Rojhilata Navî xist pêvajoyeke nû. Digel ku van tevgeran rejim hejandin û hin hikumet xistin, îredeya gelan bibandor nekirin. Lewre ev tevger ne birêxistinkirî bûn. Ne xwediyên rêbertiyên xurt û bernameyên demokratîk bûn. Weke li Sûriyê ber bi şerekî wêranker û destwerdana derve ve çû. Rewşa Iraqû li holê ye. Yeman di nava şerekî navxweyî û pencûn destwerdana derve de ye. Libya di heman rewşê de ye. Axaftina li ser van tevan mijara xebateke din e.

Em dixwazin hinekî li ser rewşa Sûriyê rawestn. Çawa ku tê zanîn Sûriye mêtîngeheke Fransa bû. Salên 1936'an Fransa û Tirkiyê li hev kirin û herêmên weke Antakya ji Tirkran re hiştin. Pêvajoyeke siyasî ya tevlîhev dest pê kir. Piştî salên 1960'î bi giranî miliyetgiriya Ereban û desthilatdariya Be´esê mohra xwe li pêvajoyê dan. Be´esê sîstema yekpartî ava kir. Li şûna ku rê ji civakeke demokratîk re veke, di binê desthilatiya Hafiz Esed de sîstemeke otorîter û milietgiriya Erebî ava bû. Vê sîstemê rê neda ku rêxistnên sîvlî-civakî, partî û fikrên cuda pêş bikevin. Miliyetkirî ewqas pêş ket ku navê dewletê kirin Komara Erebî ya Sûriyê. Halbikû li Sûriyê ji bilî Ereban gel û civakên din hebûn. Dewlet li şûna ku pêdiviyên gel pêk bîne û bibe mekanîzmayeke rêvebirina kar, bû amûreke wisa ku gel xizmeta wê bike û li ser her tiştî serdest be.

Ev sîstem ji ber ku ji demokrasiyê re girtî bû, firset neda rêxistinên cuda û rexneyan. Daxwaziyên demokratî, rexne û nêrînên cuda tev hatin serkutkirin, qedexekirin û bi xiyanetê hatin binavkirin. Xwediyên fikrên cuda yan hatin kuştin yan di zindanan de riziyan, yan ji welat reviyan. Bi vî awayî sîstemeke li gorî keyfa yên desthilatdar derket meydanê. Ti kesî nikarî rêveberan rexne bike û hesab bipirse. Îradeya gel hat bêdengkirin. Êdî dewlet bû çavkaniya her xerabiyê. Vê zordestiyê civak ji eyarên wan derxistin û afrîneriya wan kor kir. Kurd, Asûrî-Suryanî, Ermenî, Durzî û civakên din ko doza nasname û çandên xwe kirin, gefa kuştin û qirkirinê li wan hat xwarin. Di warê aborî de jî gel ji xizaniyê rizgar nebû. Jixwe li derveyî siyasetê mabûn.

Sîstemeke ku ji gel re digot, desthilatî, rêveberî û bikaranîna çavkaniyên aboriyê karê min in, tu sirf bixebite ku zikê xwe têr bikî. Girseyên gel ji bo kar ji gund û taxên xwe qut bûn û berê xwe dan bajaran yan jî welatên derve.

Rewşeke wisa derket, li saziyên dewletê, bê bertîl û bê piçûkxistin gel nikarî karê xwe bimeşîne. Baweriya gel ya bixwe şkestibû. Li şûna ku bibe welatiyekî dewletê yê azad û wekhev, bûbû koleyê wê. Tişta ku dewletê dixwest jî ev bû.

Ev hişmendî îro li Sûriyeya hilweşiyayî jî derdikeve pêşiya me. Hişmendiya Be´e û desthilatiya wê xwe li derveyî rexne û hesabpirsînê dibîne. Çawa ku li hemberî vê roxînê, şerê navxweyî û ji dagîrkeriyê re vekirî ti berpirsiyariya wê tinebe tev digere. Weke berî 2011an dixwaze hakimiyeteke mûtleq ava bike û gel stûyê xwe jê re xwar bike. Hê hebûna Kurdan û mafên wan nas nake. Hê qebûl nake ku partî û nêrînên cuda xwe bi rêxistin bikin. Di hişmendî û zêhniyeta rêveberiyê de ti guhertin çênebûne. Ev hişmendî ne dikare tiştekî bide gelê Sûriyê û ne hêviya pêşrojê jê heye. Ji ber wê kesên li Sûriê azadî û demokrasiyê dixwazin, kesên dixwazin bi ked û îradeya xwe bişîn, kesên kedkar, jin û ciwan, rewşenbîr û hunermend divê di projeya Sûriyeya demokratîk de bigihin hev û derketina ji vê tengezariyê erkê wan yê pêşî û sereke ye.